

# Pîrs

*Kovareke Rewşenbîrî û Serbixwe ye .*

## **Pêşgotin**

Merwan Berekat R 2

## **Gotar:**

- Divê dest bi geşedana zimanê kurdî bibe Merwan Berekat R 3
- Rawestînek li ser têkliyên civakî li Ewropa Mihemed Zêno R 8
- Serweriya nêremejî civaka mirovahiyê pêş naxîne Vejîna Kurd R 12
- Malbeta "Bermede" li navça Hêrimê Dr.M.Elî R 14
- Hemzeyê Muksî kî ye?! Rêberê Silivî R 16

## **Lêkolîn:**

- Efrîn ... bajar û gundên wê Dr.M.Ebdo Elî R 20

## **Wergerandin:**

- Ber bi pirojeyê kurdistanî isteratîcîk de - xelek 1 Dr. Ehmed Xelîl R 27  
Wergêr: Heyder Omer

## **Hevpeyvîn:**

- Mem Med: Evîn bi xeyala nayê pînekirin Hevpeyvîn: Parêzer R 32  
Edhem Şêxo

## **Wêje:**

- Goristana deriya yê - Çîrok Mihemed Qere Hesên R 37
- Pêlava rişko - Çîrok Osman Îso R 40
- Sembol - Pexşan Baranê Cûmê R 42
- Solînên xoyê - Helbest Merwa Birîm R 43
- Kenê berbangê - Helbest Îlham Osman R 44
- Li wir - Helbest Yûsif Îbiş R 45

## **Ziman:**

- Bikaranîna tîpên gir di nivsandina zimanê kurdî de R 46

## **Kelepûr:**

- Pêkenok R 47
- Pend û gotinên bapîran R 48
- Navê kulîkekê ji Kurdistanê R 48

Kovarapirs@yahoo.com

Buha (200) L.S

## ***Pêşgotin :***

**W**ekî çawa ku qeyrana Sûriyê bandora xwe ya neyînî li gelek warên jiyana gelê Sûrî kir, herweha bandora wê li çapemenî weşan û tevgera rewşenbîriyê jî kir. Lê çendî rewş tevlehev û xerab be, pêûsên zanyar, nivîskar, wêjevan û xebatkaran ranawestin.

Piştî ku hejmara 51ê ji kovara Pirsê di sala 2012an de hate çapkirin û belavkirin, ew ne bi biryar, lê belê ji bo astengî û diwariyên ku qeyrana Sûriyê bandora xwe li hemû warên jiyana civaka Sûrî kirine, ew rawestî.


Di dirêjîya dema rawetandinê de, xwendevanan li kovara Pirsê dipirsîn, û carcarina jî berhem ji komîta sernivîser re dihatin rêkirin.

Kovara Pirs ji dehsalan ve, ji bo xwendevanên zimanê kurdî wekî çavkaniyê bû, û ji nivîskarên zimanê kurdî re ew neynika mijarên wan bû. Ango **Pirs** a hemû xwendevan û nivîskaran bû.

Kovara Pirsê; kovareke rewşenbîrî û serbixwe ye. Naveroka wê ji lêkoîn, gotar, kelpûr û hemû hunerên wêjeyî ye. Desteya sernivîser a kovara Pirsê soz dide hemû xwendevan, nivîskar, rewşenbîr, zimanperwer, wêjevan û hezkiriyên pirsê ku ewê ji nû ve têkeve destên wan. Em hêvîdar in, ku xwedî pêûs dê bi berhemên xwe wê dewlemend bikin.

Careke din em jinûvederxistina kovara Pirsê li xwe, we û hemî gelê Kurd pîroz dikin.

***Merwan Berekat***



# Divê Dest Bi Geşedana Zimanê Kurdî Bibe

► **Merwan Berekat**

**E**ger tu bixwezî nasnameya netewî ya mirovekî winda bibe, û di neteweya te de were helandin ( pişaftin ), berî her tiştêkî zimanê wî, bi wî bide jibîrkirin, û zimanê xwe bike zimanê mal û danûstandina hemû warên jiyana wî. Ev rastiyêke dîrokî û zanistî ye. Lê ew karekî ne mirovane û ne jî dikeve xizmeta şaristaniya mirovahiyê.

Belê eger mirov li dîroka mirovahiyê vegere, û wê baş raçav bike, dê bibîne, ku gelek millet hebûn, lê roja îro ne ew, ne zimanê wan û ne jî bermayên wan mane, û hin jî, hejmareke pir hindik û belawela mane.

Ew milletên ku nemane, ne bi şer, ceng û nexweşiyên vegritane hatin tunekirin, lê belê sedema serekîn ew bû, ku ew millet li zimanê xwe xwedî derneketin. Ango ew di jiyana xwe ya rojane de bikar nanîn. Wan zimanê milletine din bi kar



anîn, û bi demê re ew di netewewan zimanan de hatin pişaftin.

Bêguman, di vî warî de, hertim rola destlatdarî û dagîrkeriyê hebû. Têvî ku hewildana şer û tunekrina zimanan, tucarî nakeve xizmeta avakirina şaristaniya mirovahiyê, lê mixabin di destpêka dîrokê de, û ta roja îro ev karê ne mirovane ji aliyê regezperest û şûfenîzman ve tê kirin.

Ji sedsalan ve dijmin û dagîrkerên Kurd û Kurdistanê bê rawestan, bi rêbaz û pirojeyên curbicur hewildane û hîn jî, berdewam in, ku zimanê kurdî winda û dêris bikin. Belkî ta astekê û nemaze di dîroka



nûjen de parek ji vî gunehî di stiwê civaka navnetewî de ye. Çimkî tucarî bi şêwakî rasteqînî piştevaniya gelê Kurd û hebûna wî ya netewî nekiriye, û ne jî rê li ber tunekirina Kurdan ji aliyê nijadperestan ve girtine, û di pir qonaxan de piştgiriya wan kiriye. Bêguman ew jî cihê mixabîniya gelê Kurd e.

Lê xewnên şûfen û nijadperestan her û her têk çûne û hîn jî têk diçin. Ji ber ku ronakbîr, rewşenbîr, zimanperwer û hişmendên Kurdan, ji ber parastin û reseniya zimanê kurdî de kedeke bê hempa dane, ta astekê ew bi demê re nûjen jî kirine. Ew jî cihê serbilindî û şanaziya gelê Kurd e. Ji erkê her Kurdekî ye, ku geweremirovên Kurd ên ku di riya pêşxistina zimanê Kurd de xebateke payebilind kirine wan ji bîr

nekin.

Zimanê kurdî yek ji zimanên kevnar e, û di pêvajoya dîroka xwe de, nemaze di serdema Mîdî û berî wê ya Mîtanî de, ewî pir şaxên zanistê yên wan serdeman ji memikên xwe yên zimanî mêjandine. Ne tenê wisa jî, lê belê di wan serdeman de, ew wek zimanekî cîhanî, dihate bikaranîn û naskirin. Ev rastiya di gelêk şopewar û girên ku di herêma Mezapotamiya de, ji aliyê lêgerînavanên Ewropî ve, yên ku di vê herêmê de lêgerîne, hatiye teqezkirin.

Ji aliyekî din ve, zimanê kurdî bandorên xwe yên zimanî, li zimanên ku bi wî re bûne hevsînor kirine, û ta roja îro jî, pir ji bêjeyên kurdî cihê xwe di ferhengên wan zimanan de girtine û wan bi kar tînin wek zimanê erebî, tirkî, farisî, û her weha di hin zimanên din de jî, wek îngilîzî, yûnanî.. û H.W.D.

Lê.. ji ber ku zimanê kurdî ji sed-salan ve, nebûye zimanê destlatdariyê û ji qadên fêrkirin, perwerdekirin û hemû warên zanistê dûr maye, mirov dikare bêje, ku ew bi gavine pir fireh li paş demê

maye. Ji ber wê jî, zor girîng û pêwîst e, ku kar û xebateke pir mezin û ji hemî aliyên de, ji bo vejîn, nûjenkirin, duristkirin û astabilindkirina wî were kirin.

Bêguman, dema ku em dibêjin ew li paş demê maye, divê were vejandin, ew netê wateya ku zimanê kurdî hatiye pişaftin, lê belê, mebest ew e, ku em bikaribin wî bikin zimanê hemû şaxên zanistê yê demê, û wî bigînin asta zimanên serdema niha. Di vê derbarê de pirseke sereke heye û ew jî ev e:

***Ma gelo emê çawa karibin bi şewakî zanistî ji bo pêşxistina zimanê kurdî bixebitin, û pirsgirêkên wî çareser bikin?***

Bêguman bersiva vê pirsê pirşax û berfireh e, lê emê li gor têgihîştina xwe hin aliyên wê bidin ber ro-nahiyê.

**Gava yekem ew e**, ku li ser asta Kurdistanê konfiranseke fireh ji zimanzan, pispor û kesên ku bi dehsalan bi zimanê kurdî mijûl in were lidarxistin. Ew konfirans dê encamdar bi sêde û başencam be, nemaze eger beşdarên wê ji hemû zaravayên zimanê kurdî bin. Ango

ew ne konfiransa zimanê kurdî û di nav du kevanan de jî ( Kurmancî ) yan jî ( Soranî ) be. Ew konfirans ne tenê çend rojan were lidarxistin û her yek ji beşdaran nêrîna xwe bide. Divê ew xwedî biryar be, di wê de komît werin avakirin û kar were hilpesartin.

Dê baş û pêşketî be, eger endamên konfiransê û yê ku cihê xwe di wan komîtan de bigrin pirtirî zimanekî zanibin, nemaze zimanên erebî, farisî, tirkî û îngilîzî, ji ber ku sê zimanên pêşîn bandora wan li zimanê kurdî bûye, û Îngilîzî jî, wek zimanekî cîhanî bandora wî li piraniya zimanên cîhanê heye.



Wekî ku nas e; sûde, rastî û encamdayîna her karekî di berdewamiya wî de ye, ji ber wê jî, dê zor baş be, eger ji salê carekê ev konfiransa were lidarxistin, û komîtên ku kar bi wan hatine hilpe-sartin, encamên karê xwe bidin ber destê komîta rêvebir a konfiransê. Ango kar û xebat bi şêwakî sazûmanî were kirin.

Dema mirov berhemên nivîsakar, lêkolînavan, helbestvan, dîroknîvîs, romanîvîs..... û H.W.D, yê zimanê kurd dixwîne, birastî xwendevan di pir aliyên de tevlêheviyê dibîne, û carina wî wî dibe û ji xwe dipirse: Ma gelo kîjan a rast e? Nemaze di warê rêzîmên, rastnivîs û bikaranîna têrman de. Ji ber wê jî, wekî hemû milletên cihanê pêwîstî û girîngî heye, ku di wê konfiransê de, komeleyeke zimanê kurdî were avakirin, û ew bibe lêvegera karûbarên zimanê kurdî, nemaze di warê danîna têrman, amadekirina ferhengan bi şêweyekî zanistî û çareserkerin û duristkerin hin pirsgerêkên rêzîmên.

Di baweriya me de yek ji pirsgerêkên mezin di jiyana zimanê kurdî de ew e ku ew bi du abêyan

( alfabiyan ) tê nivîsandin. Ji ber wê jî bandoreke wê ya neyînî li jiyana zimanê kurdî dike, û herweha ew bandora wê li xwendevan û nivîskarên jî heye. Ango xwendevan û nivîskarên ku bi abêya latînî fêrî zimanê kurdî bûne, ji wan ên ku bi karibin berhemên ku bi abêya zaravayê Soranî hatine nivîsandin bixwînin, pir kêmtir in, û li aliyê din jî wisa ye. Bêguman ev di jiyana zimanê Kurdî de lawazî ye. Ya din ji bo siberoja zimanê kurdî jî, belkî bibe metirsiyeke mezin.

Di baweriya me de, berî aliyên siyasî yê kurdî, zimazan û rewsenbîrên Kurd ji ber vê pirsgerêkê û nakokiyê de berpirsiyar in. Eger ew bi erkên xwe yê dîrokî ranebîn, û dest bi geşedan zimanê kurdî nekin, hêdî hêdî tiliyên nerazîbûna gelê Kurd wekî çawa dirêjî siyasîmedar û rêvebirên siyasî yê Kurd dibin ku çima ew li hev nakin, dê dirêjî wan jî bibin.





Bêguman, çareya vê pirsgirêkê ji aliyê kesan ve netê çareserkin. Divê ew yek ji stûbariyên sereke yên wê konfiransê bin ( konfiransa zimanê kurdî ).

Di van dehsalên dawî de, gelek saziyên fêrkirina zimanê Kurdî ( Kurmancî), li Bakur û li Rojavayê Kurdistanê hatin damezirandin, û armanca wan tevan bi şêwayê xwe yê giştî ew e, Kurdan fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bikin. Bêguman, ev kar ji bo zimanê kurdî pir hêja bû. Ango, mirov dikare bibêje ku van saziyan firkeke bi sûd xiste ji yana zimanê kurdî. Ji ber ku xwendevanên kurdî pir bûn, û di van dehsalan de geşkirina nivîsandina bi zimanê Kurdî ew jî berçav bû. Lê aliyekî wê yê neyînî jî heye, ji ber ku her saziyekê ji van saziyan mêtiryalên ( rêbazên ) taybet ji xwe re danîn, û hinan jî siyaseta û eydolojiya ( bîrdozên ) hin partiyan xistin wan mêtiryalan.

Ya din, tu hevkarî di navbera van saziyan de nîne, ango rewşa wan jî

wek rewşa partiyên kurdî ne, her yek ji wan dibêje ya min rast e.

Her demekê tê ragahandin ku konfiranseke zimên hatiye lidarxistin, lê mixabin piştî ku ew kar tê şopandin, tê nasîn ku ew ji aliyê partiyêke kurdî ve hatiye amadekirin. Belkî ew gav ewqas ne pirsgirêk be, lê pirsgirêk û mixabîniya mezin ew e ku piraniya kesên ku di warê zimên de pispore in û kesên ku bi dehsalan bi zimên mijûl in, ew nehatine vexwendin, û haya wan ji van konfiransan nîne. Birastî: Eger em xwe ji mejiyê tekane rizgar nekin, û bi şêwakî sazûmanî nexebitin, em tucarî nikarin wek tê xwestin xizmeta zimanê xwe bikin.

Ta ku ji yana zimanê kurdî derbasî geşedaneke rasteqîn bibe, û ew bi şêwakî zanistî were ravakirin û bê şaşîti were fêrkirin û perwerdekirin, divê ew nebe dîlê biryarên partiyên siyasî yên ku ta niha nikarin li hev bikin.

Ji ber wê jî em dubare dikin ku konfiranseke berfireh û li ser asta Kurdistanê ji bo zimanê kurdî were lidarxistin.

***Ziman jiyan e, divê em li ji yana xwe xwedî derkevin.***



# Rawestînek Li Ser Têkliyên Civakî Li Ewropa

► Mihemed Zêno

**D**i van sî salên dawî de, bi hezaran malbatên Kurd koçî welatên Ewropayê bûn, ew li her welatekî, û li her bajar û bajarokan bi cih bûn. Kesên me ji axa bav û kalan û ji warê xwe hatin birîn. Di mejî û wijdananê wan de, ew cih, mal, xwedî û xizim bûne bîranîn, û wêneyên wan li ser dîwarên malên xwe yên li biyaniyê danîne.

Di serî de mirovê Kurd gelekî bi hatina van welatan şad dibe, ew ji belngazî, hejarî û paşeroja nediyar rizgar dibe. Ew ji tirs, asayiş, karmend û sawa endamên parastinê azad dibe. Ew ji xem, qisaweta xwendin û xwedîkirina zarok û malbatê azad dibe. Ew ji nebûna pere û alavên xweşiya jiyane bi dûr dikeve.

Piştî demeke kurt mirovê Kurd dibe xwediyê hin peran, û alavên jiyane yên herî nûjen dixwe mala xwe. Ew dibe xwedî tirimbêl ku yek ji xewnên ciwaniya wî bû. Zarok bê



xem diçin dibîstanan û xwendina wan bi serdikeve. Ango, sibe deriyê zangoyên herî navdar li ber wan vedibin, û her wiha mirovê Kurd dikane bê zehmet hin alîkariyê ji xizim û mervên xwe re rêke.

Gelek mirovan xanî, zevî û firoşgeh li welêt kirîn bi armanca ku ewê rojekê vegerin welêt. Ango mayîna wî li welatên biyaniyê demkî ye, tenê ji bo çend salan e. Di hiş û bîra mirovê Kurd de ramana vegera welêt hertim heye. Ew di xeyalên xwe de her roj li wir e, li ba mirovên xwe ye. Ew bi agahiyên ku ji welêt digînine wî dilşad dibe, û nûçeyên ne baş xemgîn dibe.

Mirovê Kurd bi laş û canê xwe li Ewropa ye, lê bi hiş û ramana xwe li welêt e.



Bi salan re mirovê Kurd hêdîka tuşî hin arîşe û pirsgirêkan dibe, ewê ku di bin cila xweşiya jiyane de veşartî bûn. Bi demê re bala Kesên me diçe ser wê yekê ku ew li vir bi tenha xwe ye, ne bav, ne dê, ne ap, ne xal, ne xizim û ne jî nas û dost. Her kes bi jiyana xwe ve hatiye girêdan û di pirsên xwe de mijûl e.

Li şahiyên kêma kes hene bi wî re şa bibin. Li şînan kêma kes hene bi wî re du-sê rondikan bibarînin. Li van bajaran em tuşî jiyaneke nû dibin. Ji nişkeve em bûn cîranê kesine biyanî yên ji her welatên cîhanê li vir bi cih û war bûn e, ji Rûs û Turkan ji Ereban û Farisan ji Cîngan û Efganan ji Efrîqî û Çînan ji Alman û Yonanistanê û her yek ji wan bi derd, êş û kulên xwe ve mijûl e.

Mirovê Kurd bê çare ye bi wan re bikeve dan û standinan û bi demê re têkliyên nû bi wan re tên afirandin û girêdan, û çandeke nû tê peydakirin. Mirov dibe bizanibe ku karaktirên têkliyên civakî li van welatan ji yên li welatên Rojhilata Navîn cuda ne.

Li welatên Rojhilata Navîn têkliyên civakî bêhtir karaktirêkî xwe yê

komî heye. Ango kalêktîv e. Li van welatan ew têklî sîfeta tenayî / individuell werdigr e. Bingeha van herdu cureyên têkliyan aborî û civakî ye. Têkliyên civaka burjwazî mirovan ber bi tenahiyê ve dikêşe, mirov bêhtir bi cihê kar û alavên kar ve girêdayî ye. Bi hemû hêza xwe ew bi cihê kar û mercên kar ve mijûl e. Ew hewil dide ta ku wî cihê ji dest xwe bernede, ew kaniya wî ye; di ramana xwe de mirov herdem dirame, gelo eger ez bê kar mam, ezê çawa karekî din peyda bikim?



Ev raman dike ku têkliyên mirov bi mirov re kêm bibin, sal derbaz dibin û mirov nizane navê cîranê wî çi ye, û ew çi karî dike? Pêwîstî bi danûstandina berferê tune. Ev jiyana welatên kapîtalîst e. Ew ji jiyana welatê ku hîn bandora jiyana axatî û çandiniyê cuda ye.

Li vir mirov girêdayî fabrîke û kargehan e, lê li wir mirov bêhtir girêdayî axê ye. Mirovên me ji welatên Rojhilat hatin e, ew zûbizû nikanin fêrî jiyana navxweyî ya van welatan bibin, ew ji encamên vê jiyane bi tirs in, û mirovê biyanî bi germî tevî civaka vir nab e.

Ji ber wê jî herdem ramana vege- ra welêt di xeyala me de ye. Her çendî Kurd li van welatan pir bûne, lê dîsa jî hevdîtin gelek kêmtir in, ew jî ji ber sedemên kar e. Ji berbanga sibehê ve ta derngiya rojê mirov li kar e, û dema êvarê vedigere mal westayî ye, û xwe bi gefikên malê ve mijûl dike.

Lê çawa zarok dixwînin û çawa jiyana wan derbaz dibe; ew zarok bi çi mijûl in û dost hevalên wan kî ne? Ev pirs gelek kêmtir dikevin ro- jê.

Zarokên me di dibîstan û kolanên van welatan de tên perwerdekirin, ne di malbatan de. Bandora dibîstan, kolan û alavên ragihandinê ji ya malê bi hêztir e. Di malan de gelek caran gotina " na " tê gotin. Ev xwerin ji me re nabe. Ev cil ji me re nabin. Çûna li cem hevalekî nabe. Em Kurd in ev tişt ji bo me nabe. Mirov jî bi karaktirê xwe ji "na" di- reve, û ji "erê" hez dike. Na sînor e... Erê azadî ye. "

Di piraniya malên Kurdan de şer û pevçûna "erê" û "na " heye. Ev nakokî dike ku gelek xort û keç ji mala bavê xwe birevin û xwe radestî dezgehên dewletê bikin, û ji xwendin û dibîstanan dûr kevin. Ew di jiyana xwe de tûşî kar û bûyerên genî û pîs dibin û li dawiyê dibin mêvanê dadgeh û girtîgehan.



Mirovê Kurd hewil dide ku zarokên xwe li ser koka adaten Kurdistanê perwerde bibin, ango wekî çawa ew bi xwe fêrî jiyane bûye. Û di demekê de ku ew mercên jiyane li van welatan hatine guhartin û di encamê de perwerdeyê nû bi xwe peyda dike, demek her civakek rengê wê yê adetan heye, ne her tiştek li welatê me ciwan û hêja ye, wê li van welatan jî bi wî nirxî be. Her wiha ne her tiştek li van welatan ciwan û bi qedir be wê li ba me jî wisa be.

Ya ku ez dixwezim bêjim ew e, ku em nikanin li welatên Ewropa nifşên nûgihayî li gora nirxên Kutdistanê perwerde bikin. Ew di jiyaneke nû de dijîn, ya baş ew e ku bibin alîkar ta ku zarokên me bi hêminî bigihên delavê aramiyê di keftlefa jiyane de.

Jiyana van welatan gelek bi lez e, li her rojê tiştekî nû tê afirandin, pêşketina teknîkî bi xwe re hin adetan tîne û dadikeve hundirê malên me. Bê vîna me ew dibin beşek ji jiyana me. Li welatên Ewropî mirovê ku dema wî tunebe mîna li welatê bi se'tan li ba hev



rûdinin. Em ketine nav lehiyê xurt, lehiya şaristaniyê,... Mirov li van welatan her dem di lebat û tevgerê de ye. Ew ne aram e. Ew ketiye bin bandora jiyana teknîk û afirandina alavên wê. Eger li kolanên bajaran mirov pirsekê bike seyr nabîne ku ew bersiveke neyînî bibihîse, wek: Li min biborîne dema min tune ye. Ev li vir tiştekî xweza ye. Mirovê me jî gav bi gav li pey civaka ewropîyan diçe û bi demê re, nifşek li pey yê din wê wek wan bibin.

# Serweriya Nêremejî

## Civaka Mirovahiyê Pêş Naxîne



### ► Vejîna Kurd

**B**êguman ewlehî, aştî û demoqrati stûnên serkeftina civaka mirovahiyê ne, vajayî wê jî zordarî, setemkarî û lihevnekirin hilweşandina wê ne. Lê mixabin heya roja îro hîn zihniyeta dijîtî û zordariyê di mejiyê mirovan de cihekî mezin girtiye, û di jiyana rojane de ew di têklî û danûstandinan bi kar tê.

Diyardeya zordariyê gelek kevna e, û her kêlîkekê, li vir an li wir, di meydana mirovahiyê de dijene, li pêş aştî û ewlehiyê astengek xwe nîşan dide..... Eger em bixwezî wê binasin em dikarin bêjin ku ZORDARÎ şêweyek an lebateke mirovane, ku hêz, zor û dijayeti ji ali-

yekî ve dertên " dibe ew alî mirovek an jî destlatak be" û li dijî aliyekî din bikar tê, armanc jê ew e ku aliyê duyem bîndest bike, û bi wê helwestê re jî, gelek ziyanên aborî û derûnî derdikevin holê. Di vê gotarê de, me xwest em girîngiyê bidin zordariya "şideta" ku li dijî jinan tê kirin, ji ber ku tu roj derbas nabin û em nebihîsin ku zordarî li ser jinekê, bi awayekî eşkere yan bi rêbazên veşartî bi kar tên. Ew jî tinazeke mezin e di dermafê rûmeta mirovahiyê de, û windabûna mafên mirovan e, û ew li ser bingeheke koltorî, civakî, aborî, siyasî û yasayî ava dibe.

Belê; zordariya ku li dijî jinê tê kirin pirseke piralî ye, divê ne tenê jin, lê pêwîst e her kesê xwe mirov dibîne li ser kesayetiya xwe raweste ku çiqasî li ser jinê destlatdar û zordar e, ji ber ku ev diyardeya di nav hemû pêkhatayên civakê de tê dîtin, û tucarî ew bi aliyekî ji aliyên civakê, yan ol, çand, pêşketin

û şaristaniya dewletekê yan jî paşdemayîna wê ve ne girêdayî ye.

Birastî, şeweyên zordariyê pir in wek lêdan, kuştin, destdirêjiya zayendê, bazirganiya jinan, zewaca bi zorê, sinetkirina jinan, recm..... û H.W.D. Lê em kanin bêjin ew hemû rengên zordariyê ne, ew jî bikanîna hêza govdeyî, aborî û derûnî li dijî jinê û çandekê ku mafê wekheviya jin û mêran mikûr nîne û rê li pêş bindestkirina jinê vedike. Belê, îro di sedsala bîst û yekê de jî, hîn li gelek welatan jin di warê raman, vîn û fîzîkî de rastî zordarî û destdirêjiyê tê, di bin navê adet û baweriyên kevnaresî de, li ser wê hîn pîvanên paşverû tên danîn. Eger em bûyerên kuştinê "wek nimûne" bişopînin, emê bibînin ku mêr ji aliyê kesên biyanî ve tên kuştin, lê di heman demê de jin ji aliyê hevjinê xwe û bav an birayê wê ve tê kuştin. Ji Efrîqiya ta Kurdistanê, her roj bi dehan jin jiyanê xwe bi dawî dikin. an tên kuştin.. çima?!!!!

Bêguman gelek sedemên wê yên curbecur hene, lê di rastiyê de ew tev ji kaniyeke dîrokî dertên, ew ji civaka nêremejiya ku mêr serweriya

wê dikin û piraniya cîhanê pê tê rêvebirin. Di hemû serdemên dîrokî de, yên ku mêran aborî û serwerî xistine destên xwe, destlatdarî û zordarî li jinê hatine kirin. Ji ber ku di serdema neyolîtîk de, dema mêr li çol û çiyên nêçîrvanî dikir, jinê tov diçandin û aborî dida afirandin, û bi wê civaka mirovahiyê çêdikir.

Ji ber girîngiya rola jinê di jiyana mirovahiyê de, di pir serdemên dîrokî de jin wek xwedêwendan hatin binavkirin, û li ber pûtên wan nimêj dihate kirin. Pişt re mêr xwest serûberê rêveberiyê bi dest xwe xîne, û herwisa civakeke nêremejî ava bike, û dema gihîştê wê armancê wî dest bi zordarî û bindestkirina jinê kir.

Ma gelo civakek bi vî mejî, wê çawa bi dadmendî, demokratî û awayekî durust li mafê jinan mêze bike?!!

Eger em bixwezin pêşketin û şaristaniyê bistînin, divê berî her tiştî em mejiyê xwe ji hemû ezîtiya nêremejîtiyê bişon û jiyanê mirovahiyê bi gulên azadiyê bixemlînin, ta jin û mêr bi hev re jiyanê azad parve bikin.



## Malbeta " Bermede " Li Navça Hêrimê

*Gelek kes û malbatên navdr ku ji binyata xwe de Kurd in li bajarê Helebê û li navçeyên derdora wê hene. Erê roja îro wan zimanê Kurdî ji bîr kiriye û xwe wek*



*Ereb dinasin, lê li demên ku wan xwe Kurd dîtin û wek Kurd jî dihatin naskirin, ew navdar û xudî rol dewrên mezin bûn. Ê bandora wan a civakî û aborî jî li ser beşekî fereh ji komelgeha bakur û rojavayê wîlayeta Helebê ya Osmanî û pişt re jî ya Sûriyê hebû, ji bilî ku dest û rola wan di bûyer û karnavên destlata Osmanî û paşê jî di ya Sûrî de û di da mezrandina wê bixwe de jî bercav û pir giring bû. Yek ji wan malbatan "Mala Bermede" ye. Wêk tê zanîn, mala "Bermede" ya destpêkê ye ku li bajarê Hêrimê ((navenda Navça Harêmê)) rûniştiye û şên kiriye. Li derbarê wê malbatê û koka wê wiha di pirtûka Şêx Kamêl El-Xezî de hatiye :*

### ► Dr.M.Elî

((Malbeta navdar a yekê ye li navça Hêrimê. Ji bapîrên wê yên destpêkê ku li vî bajarokî tên bi bîr anîn Hesên Axa, Husên Axa û Ehmed Axa kurên Mistefa Axa ne. Ew ji koka xwe de ji malbateke Kurd û ji hoza Berazî ne, berê li derdora Sirûcê ku bi ser bajarê Rihayê ve ye

rûdiniştin, ew ji malmezînen wê hozê bûn û li ser hozên Kurdan ên wan deveran serdar bûn. Ê dema ku hêzdariya wan ji destlata Osmanî re bû serêş û giranî, li derdora sala 1240î.g ew neçar kirin ku bi devera Cûmê de koç bibin.

Li wê demê, bavê wan Mistefa Axa li ser rê dimire . Ê piştî ku

demekê li Cûmê dimînin, destlat Osmanî dîsa wan ferman dike ku bar kin û li devera Hêrimê rûnin. Û ji ber ku ew bêmal bûn, ew li wir di bin konan de rûniştin.

Li sala 1243an.g waliyê Bexdadê li hember dewletê rabû. Wê hîngê dewletê, ji bo lûskirina wî, waliyê Helebê Elî Rida Paşa ustubar kir, wî jî Bekir Ax ketxida ji nav her sê lawên Mistefa Axa Hesên Axa jî bi xwe re bir û bi ser Bexdadê de girtin, û kirin ku waliyê wê vegere bi konê dewletê. Ji ber ku Hesên Axa di şer û pevçûnan de jîr û çalak bû, dewlet ji malbata wî razî bû û xirab Hêrimê û hinek zevî ji derdorên wê danê. Û ji ji wê demê de wan avahî lê rakirin, û rê dan her kesê ku dixwest li ba wan rûne xaniyan ava bikin û lê bi cih bibin. Û herwiha bi derbsbûna salan re ew xirabeyê ku bi sedsalan kaviil û bê kes bû, şên û gulvedayî bû.

Ji navdarên vê malbatê li Hêrimê yên ku ez gihîtimê, dilovanî Ehmed Axa kurê Mistefa Axa kurê Ehmed Axa kurê Mistefa Axa ye. Dilovaniya Xwedê li ser be, ew gernas, camêr bû, mala wî cihê mêvantiyê bû,

xwedî jiyaneke pak bû, û şora wî li ba destlatdaran dihat bihîstin. Lawên wî yên rêzdar Necîb Axa, Mistefa Axa û Faris Axa li şopa wî diçin û navdariya wî diparêzin.

Ji gernasên vê malbatê, mirovê hişmend û gernas Mistefa Beg kurê Sadiq Efendî kurê Husên Axa yek her sê birayên destpêkê bû. Ew di nav kesên ji hevsalên xwe, xûnazik, têgihîştî, rûmetdar û dûrbîn, ligel bersivdan lezok, rast û durust bû, ji bilî ku ew zor baş bi zagonên dewletê û sazûmanên wê zanî. Ew di çend warên destlatê yên bilind de xebitiye, ya dawîn destlatdariya tevahiya Dewleta Helebê kir, ew demekê tê de ma, lê bi dilxwaziya xwe ew post berda. Û ji ber ku ew mirovekî dilsoz û bi rû bû, xelkê jê hez kir, ew jî bi serfirazî xebitî û tê bi serket, û jiyana xwe bi hebûn û bi destferhî borand)).





# Hemzeyê Muksî kî ye?!

► **Amadekirin: Rêberê Silivî**

**H**emzeyê Muksî, yek ji wan rewşenbîr, zana û xebatkarên gelê me ye, ên ku di destpêka sedsala bîstan de, li Stembolê dest bi kar û xebatê kirine. Û bi amanca rizgarkirina Kurdistanê ji bin destê Osmaniyan zend û bendên xwe badane. Ji ber vê yekê jî, wî gelek komelên civakî û wêjeyî, li Stembolê saz kirine.

Herweha, Hemzeyê Muksî yek e ji wan endamên navdar û naskirî ye ji komela xwendekarên Kurd "Hêvî", ya ku di roja 27.07.1912an de, li Stembolê hatibû damezrandin.

Û ji ber ku tîn û kela dilê vî mêrxazê hêja bi wî qasî nedişkêst, dîsa H.Muksî, piştî şerê cîhanê yê pêşîn digel çend zana û xebatkarên Kurd ên dilsoj û dilsoz, "Komela Pêşketina Kurdistanê" li Stembolê saz kirine, û di roja 07.11.1918an de, kovareke heftane bi kurdî û tirkî, bi navê (JÎN) weşandine, xwedî û berpirsyarê wê bûye Hemzeyê Muksî, yê ku 20 hejmar jê weşandine, paşê, serokatiya wê sipartine re-



wşenbîr û têkoşerê Kurd Memdûh Selîm. Memdûh Selîm jî, ji hejmara 21ê heta hejmara 25an, ango hejmara dawî weşandiye.

"Komela Pêşketina Kurdistanê" û Kovara JÎN, roleke pir bilind û hêja di dîroka gelê me yê bindest de, di wê qonaxê de lîstine. Li hêlekê, "Komela Pêşketina Kurdistanê" di dema xwe de, bi navê gelê Kurd û tevgera wî ya rêzanî peyivî ye, her û her doza rizgariya Kurdisanê bilind kiriye, ta ku "Şerîf Paşa" bi navê nûnerê Kurdistanê şandiye Konferansa Parîsê û peymanê Sêvrê li wê derê imze kiriye.

Peymana Sêvrê yek e ji destkewtî û serkewtiyên gelê Kurd a dîrokî ye, çimku têde sazkirina Kurdistaneke serbixwe û azad bi dewleta Osmanî û dewletên xerbê û nûnerê Ermenîyan daye pejirandin "qebûl kirin".

Ev e, yek ji şêrîntîrîn meyweyê vê komela ciwan bû.

Li hêla din jî, Kovara JÎN, bi rêberiya Hemzeyê Muksî daye ser rîya azadî û serfiraziyê, derd û êşên gel ser sîng û berê xwe weşandine, rewşa wî berçav kiriye, dadomendiya doza wî û mafên wî yên netewî daye xuyakirin...Herweha JÎNê, dengê xwe bilind kiriye û bi qêrîn gotiye: "Na"...Na ji kiryar û pîlanên ne mirovane û kirêt re, yên li dij Kurdan ji bal dewleta Tirk ve dihatin hûnan. JÎNê gotiye: " Ji valakirina Kurdistanê ji xelkên wê yên Kurd re sed na ".

Di hejmar 1-ê ji JÎNê de, kurte gotarek li ser qaba wê, di bin sernivîsa "amanca me" hatiye nivîsandin, mirov ji wê kurtegotarê, nerîn, raman û armancên JÎNê dinase, wiha hatiye:

**" JÎN, ne ji bo destxistina lişteka "menfe'teka" madî derdikeve, amanca wê, belavkirina zanîne ye. Li ser jiyana Kurd a dîrokî, heqên wî yên netewî, bêjeya wî û rewşa wî ya civakî ku ji sedsalên dirêj virde hatine ihmalkirin. Li gora bawerîya me, amadekirina ciyekî layiq ji bo netewê Kurd di civîngeha neteweyan de, bi xe-**

**bateke wisa mumkin e, ku ev awayê wê xebatê li gora fama vê demê be.**

**Em têdigihîn ku ev teşebbusa me, xebateke pir dijwar dixwaze. Belam, dema ku me ev wezîfa giran da ser milê xwe, me bi rastî hêvî kir, ku em dikarin xwe bispêrin alîkarî û hêsaniyên madî û mênawî yên neteweyê Kurd. Ev neteweyê Kurd ku ji bo welat û gelê xwe, hertim bi qebûlkirina fîdakariyên mezin hatiye naskirin. Rastî û lêkanî ji Xwedê ye."**

Sala 1919an,"Komela Kurd ji bo belavkirina zanîne û weşanan ", Mem û Zîna Ehmedê Xanî yekemîn car çap kiriye. Hozan û mamosteyê mezin Hemzeyê Muksî, pêşgotinek bi rêk û pêk bi sernivîsa "Dîbace" jê re nivîsandiye. Tevî ku bêjeyên zimanê Erebi bi piranî cî girtine jî, lê belê di naveroka xwe de, pêşgotina Muksî, pir zengîn û bilind e.

H.Muksî, li ser stûbarê Kurdan di dîbacê de dipeyive, û di warê guhdan û parastina asar, tore û zimanê dê yê şêrîn de weha dibêje:

**"...Xasma di vî e'srî de, di dema medeniyetê de, hicet û berata mi-letan lîsan û edebiyatê wan e, yê bê hicet bê berat, da'wa wî nayêt sekirin, kes guhê xwe naditê.**

***Meger malûm bibit ku berata wî jê hatiye standin, ji bo isbata vê dawayê û danîna xêma miletiya xwe, hindek ji xortê me, şev û roj serfa heyata xwe dikin, asarê qedîm, neşrê wî yê teze çêdikin, yek ji wan asarê kevin"Mem û Zîn e", ku sertac ibtîhaca Kurdan Ehmedê Xanî di(1105)da nivîsiye.."***

H.Muksî, dîsa di dîbacê de dibêje ku Ehmedê Xanî yê Kurd, bi zanîn û farisiya xwe ne kêrî Firdewsî yê Îranî ye, dibêje:

***"...Çunke Firdewsî biqelema xwe Îran vejand, Ehmedê Xanî nehişt ku Kurdistan tamam bimrit, û mewta muebbed xilas kir. Ema tamam ehya nekir, çunke zemanê Firdewsî ji bo fikra wî musa'id bû. Zemanê Ehmedê Xanî xayet berebad û çetin bû. Dewleta Osmanî digel hikûmeta Îranê muttefeqen Kurdistan di mabeyna xwe de teqşîm kiribûn, dest-pê wan wisa girê dabûn ku nedikarîn xwe bihejinin. Çunke made çawan esker soq li ser wan dikirin, bi enwa'ê hîle û desîsan ixtîlaf û şîqaq êxistibûne nav Kurdan..."***

Di dawîya dîbaca xwe de, destên xwe berjor dike, ji Xwedê hêvî û la-

van dike ku xortên Kurdan biparêze, rê li pêş wan dîz bike û dibêje:

***"...Ya Reb!, tu wan mehfûz bidêrî û muwefeq bike.."***

Hemzeyê Muksî, li Sûriyê, dûtî WANê, roja Şemiyê 15ê Remezana 1377an koçî(5ê meha Nîsana sala 1958an), piştî jiyaneke tev xebat, tev derd û kulên giran, rewanê xwe yê pak siparte Xwedayê mezin û di xaka Kurdistanê bav û kalan de, bi destê heval, hogir û dostan, bi destê welatevînên Kurd hatiye veşartin.

Gora vî comerdê payebilind, li Cizîrê dimîne, li gundê"Dugirê" yê nêzîkî bajarê "Tirbespiyê" ye. Li ser kêla wî, helbesteke di kevir de ko-layî heye, bi tîpên erebî hatiye nivîsandin, lê mixabin, navê helbestvan ji me ve ne xuya ye. Ev e deqa wê helbestê bi tîpên Kurdî:

**Mamoste Hemze Beg, rehberê fîdakar**


**Pir kes ji xew te kirine hişyar  
Raze bi xoşî bes e menala  
Peyman elê me ew hewala  
Roja ku welat bijî bibînim  
Ez mijde bi xwe ji bo te bînim.**

Li ser kêla wî ya rojhilat jî bi zim-anê erebî, ev nivîsa jêrîn heye:

## الفاتحة

هذا قبر المرحوم الجنائي حمزة بك ابن الحاج بكير  
توفي إلى رحمة الله وعفوه  
في ١٥ من شهر رمضان المبارك سنة ١٣٧٧

\*\*\*\*\*



Dawî...Dixwazim bêjim ev nivîsara piçûk, tenê danasîna Hemzeyê Muksî ye, hêvîdar im, di pêşendê de, rewşenbîrên Kurd, lêkolînan li ser jîneriya wî, kar û xebata wî çêkin, çimku mirovê di saxiya xwe de dil û hişê xwe dabe miletê xwe, hêja ye ku miletê wî jî , wî ji bîr neke, navê wî bi rûmet û bilind di dilê xwe de biparêze.

### Jêder:

- 1.Cildê 1ê Kovara JÎN.
- 2."Mem û Zîn"...Ehmedê Xanî.
- 3.Pirtûka biyografîk ya li ser jiyana, serborî û mucadela HemzeBegê Muksî, ji weşanên Kentê.

# Efrîn

## Bajar û Gundên wê

► **Dr.Mihemed Ebdo Elî**

**B**ajarê Efrînê navenda “Devera Navend” e, û navenda Navça Efrînê ye. Şêst û pênc gund û cihên şên di çarçewa kargêrî ya devera navend- Efrîn - de hene. Pênc jê warên vala ne.

Sînôrên De.Navend wiha ne: Li rojava Devera Cindirêsê, li bakur deverên Şera û Mabeta, li rojhilat Navça Ezazê û ji başûr de jî Na.Sem'anê ne.

### **Bajarê Efrîn ê:**

- Efrîn, navê Çemê Efrînê ye. Me navê “Efrînê” di çar jêderên dîrokî ji serdemên destpêka Îslamî de, dît, ew jî ev bûn: [Dîroka Hêlebê ya El-'Zîmî, di rûpela bûyerên sala 478g/1085z. Subh El-E'şa ya El-Qelqeshendî, rûpel 57. El-Durr El-Muntexeb ya Ibin El-Şu'hnê, rûpel 167. Mu'cem El-Buldan ya Yaqût El-Hemwî, beşê diduyan, rûpel 180].

Ango jêdera herî kevin, ya ku navê Efrînê tê de hatiye, ji sala 1085z de ye. Lê belê ew jêder



çêrekok û wateya navê “Efrîn” nebûne. Lê belê li derbarê wateya wî navî di jêderine de wiha hatiye:

### **1.“Efrîn” di jêderên erebî de:**

Di ferhenga zimanê Erebi “Ferhenga El-Wesît” de hatiye, ku ('efêr û 'efer), tiştê ku tiştine ne ji rengê wê tevlê bûne, tiştêk “ 'efrî ye”, yanê ax tevlê bûye.

Di ferhenga “Lîsan El-Ereb” de jî hatiye: Ku (îffîrrîn) ango kar û kirinên Şêran e, dibêjin ew bi wateya Şêr jî tê, û ji her kesekî xort û bi hêz re jî dibêjin: Şêrê îffîrrînê.

Xêriddîn El-Esedî jî di ferhenga xwe de dibêje, bêjeya Efrîn bi wateya “ax, xak” e. Wî ji Baba Şelhet biriye û dibêje jî: Ew bi wateya “toz” jî tê, /beş 5, rûpel 413/.

Ebdela El-Ĥilû jî, li derbarê şiroveyên jorîn wiha dipirse: ((Gelo! Ma ew navçe “Efrîn” berê pir bi toz bû, ta ku pê hatiye binavkirin? Bi rastî jî, ji bilî wê şiroveyê rê tune!)), /rûpel 396/. Lê diyar e ku rêzdar El-Ĥilû navça Efrînê ne dîtîye, û nizane jî ku ew navçeke bi av û darûber e, û toz lê ranabe.

## **2.Efrîn di deqên Aşorî û Yûnanîyan de:**

Di deqeke Aşûrî de ji sala 876an b.z hatiye û dibêje, ku “çemê Aprie deşta Patinê av dide”<sup>(1)</sup>. Dîroknivîsê Yûnanî yê navdar Strabûn jî di sed-sala yekê berî zayînê de, navê çemê Efrînê bi raweya “Aprie” nivîsiye.

Li derbarî bêtîya “Aprie”, lêkolînan li hev dîkin, ku ew ji bin-yata xwe de ji zimanê “Lîsînî” ye, Lîsîn jî zimanekî Hindo Ewropî yî kevin bû li Anadolê, rengê wê bêtîyê yê kevin û resen “Eple” ye.

Wekî ku em dizanin, raya/koka wê bêtîyê “Ap-” e, ew kît di zimanên Arî yên kevin de bi wateya “Av”ê tê, jixwe zimanê Kurdî jî di nav wan de ye. Kurd jî li gor zaravên xwe, pir caran tîpa “p” bi “v” diguhêrin û herwiha Ap dibe “Av”.

Raweya bêtîya “Ap” hîn li

Nîvgirava Hindî wek şeweyê xwe yê berê maye, û wek “Ab, Ap” bi lêv dibe, nimûne, navê herêma “Bincab” ji du bêtîyan pêk tê, Pênc û Ap, ango “pênc av”. Û ji ber ku tîpa “p” di Alfebeya Erebi de tune, ew carina bi tîpa “v” tê guhertin, tîpa “a” jî bi “ع”ê guhertin, ango kîta yekê ji bêtîya “Aprê” yanê “ap” dibe “عف”.

Kîta dawiyê “-re” jî, kîta yekê ye ji bêtîya kurdî ya kevin “riwîn, riwên”, ew jî bi wateya “rengê axî, rengê heriyê yê mor” tê. Wek nimûne, Kurd ji bizina rengê wê axî yan qeşwerengî re dibêjin: Bizina Riwîn, ango ya “bi rengê axê”. Dibêjin jî “Ava Riwîn” ango ava ku bi rengê axê ye.

Eger em wan her du bêtîyan “Av û Riwîn” têkil hev bikin, dê navekî nû bafire: Avariwîn yan Avriwîn.







Wek tê dîtîn, ew nav hema hema mîna raweya bêjeya “Afrîn, ”عفرین, û wateya “ava rengê wê sor û axî” dide. Gava ku lehî ji çiyayî bi ser çemê Efrînê de tên, reng û salixên ava wî wek ava “riwîn dibe”. Hîn jî şênîyê gundên bakurî ji Na.Efrînê, navê çem wek “Efran” bi lêv dikin, ew bêje jî pûş, gemara daristanan, ax û kefa ku bi ser rûyê lehiya çem dikeve, dest nîşan dike.

Lê bi awakî din, eger em raya diduyan ya bêjeyê “-rê, -lê” bi wateya “Rêk ango newala avê, cow...” bibin, wateya navê Efrînê dê bibe “rêk yan rêçûna avê”, wek tê dîtîn, ev nav jî di çarçewa zimanê kurdî de ye, û jê dernakeve.

**3 - Afrîn:** Ev jî bêjeyê kurdî ye, bi wateya afrandin û dayîna bê sînor tê. Çemê Efrînê, berê û niha jî jiyan afrandiye, û bûye jêdera

dayîna wê. Bi sedan gundên şên ji kevin de li ser kenarên wî hatine avakirin, û hîn kaviyên gelek gund, bajar û kelayên kevin li ser her du milên wî hene. Ji ber wê jî, hîç ne dûr e, ku Kurdan salixa “dayîna jiyane û berhemdayîne – Afrînê” daye wî, wekî ku navê jinan jî kirine “Afret” ku wateya “afiravana jiyane” dide.

Lê tevî hemî tiştî, û eger koka navê Efrînê û wateya wî çî be û ne çî be jî, gelên Horî, Hitît û piştî wan Medî, wekî ku bapîrên Kurda ne, ji demên berî zayîne de, û bi şeweyekî herdem, li navçeyên Torosê hebûn, û ew dever ji warên wan yê resen bû. Hîn jî bi sedan gund û warên Kurdan ên şên li dirêjîya kenarên çemê Efrînê hene, û lê rûdinin. Loma jî, eger navê çem Aprîe, Efrîn yan jî Afrîn be, ew û devera wî, herdem bi Kurdan hatiye naskirin.

Lê ya rast jî, naskirina koka navên kevin mijar û pirseke zor dijwar e, û herdem cihê danûstandinê ye.

- Li derbarî cihê bajarê Efrînê, di jêderên dîrokî de hatiye, ku li serdema romanî, rîyeke kevirkirî ya lezok



tê re derbas dibû. Di encama kolana zemînê de li derdora kolana “Ellîwa-Riya Cindirêsê”, kevirên şekirî yên mezin, kûzên qermîtî yên mezin û qerqodeyên mirovan hatin der, ew jî destnîşan dikin, ku ew cih ji demên pir kevin de şên bû.

Ji bilî wê, gelek şikeft li bakurê cihê kompaniya Eletrîkê ya kevin, li ber perava çemê Efrînê hebûn, ew cih wek rawestgehekê bû li aliyê çem yê rastê, ew şikeft ji bo rawestîn û rûniştina rêwiyên dihatin bikaranîn, derhatina gelek pereyên kevin ji nav axa zemîna wan şikeftan, wê yekê dupat dike.

Jêderên dîrokî bibîr tînin jî, ku li derdora sedsala çardehên zayînî, pireke bi navê “Pira Qîbar” li ser çemê Efrînê li cihê bajarê yê niha hebû.

Li dawiya serdema Osmanî jî, gelek Xan ji bo rawestîna karwanan li aliyê rojavaya pira niha hebûn.

Bajarê Efrînê yê niha li destpêka dema dagîrkirina Firensiyên, ango ji

destpêka salên bîstan de ji sedsala bîstan, hatiye avakirin. Li destpêkê, avahiyên destlatê û kargêriyê hatin avakirin, wek: “Sera, baregeha polîs, girtîgeh û dibistan”... Pişt re xelk li wir hêwirî, xanî lê ava kirin û wilo berebere bû bajar û şên bû.

Li roja îro Efrîn fere bûye, bûye bajarekî mezin, û gelek guçeyên nûh lê hatine damezrandin. Guçeyên bajarê Efrînê yên sereke jî ev in:

- **Bajarê kevin:** Avahiyên destlatê û kargêriya wê, di salên di navbera 1925an û 1930î de hatin avakirin. Li wê demê, kolana riya Cindirêsê hat vekirin, û dukan, xanên kirînfirotinê, xanên dewêr û du ûtêlên biçûk jî li her du aliyên wê hatin avakirin.

Rûniştvanên bajarê Efrînê yên destpêkê, Kurdên gundê Kersanê bûn. Li wê demê, hin Axeyên navçê jî mal lê ava kirin, wek Ağeyên Şêx Sim'î, Mala Robarî, Seydê Mîmê, Ehmedê Xelîl Axa û Dewrêşê Şemo rêberê Êzdiyan...

Bi wan re, hin Ermenên ku ji ber



setema Tirkan direvîn û xwe dispartin artêşa Firensiyan jî, xanî li derdora avahiyên dewletê ava kirin, wan kinîsek jî ji xwe re ava kir, lê belê ew li salên sî û çelî ji sedsala bîstan ji Efrînê derketin, kinîse jî li destpêka salên heftê ji sedsala bîstan hat firotan û hat hilweşandin, û dukan û avahî li şûnê rabû.

Efrîn ra dawiya salên şêstî ji sedsala bîstan wek bajarokêkî biçûk bû. Xaniyên wê bi şêweyekî lihevhatî û şêrîn li ser pesarê başûrê bêla Efrînê rêz dibûn. Piraniya wan xaniyan bi keviran û bi axê hati bûn avakirin, banên wan jî dîrek û ax bûn.

Ji destpêka salên heftê de ji sedsala borî, hejmareke mezin ji rûniştvanên nû, ji gund, deverên navçê û ji navçeyên din jî bi ser bajarê Efrînê de hatin, herwiha bajar fere bû, avahî lê pir bûn, û guçeyên nû li bajêr zêde bûn, ew jî ev in:

- **Guçeya Mehmûdiyê:** Li bakur rojavaya bajêr e. Li destpêka salên heftê ji sedsala borî, kesê bi navê Mehmûdê Kurtancî malek lê ava kir, û guçe bi wî navî hat binavkirin.

- **Guçeya Zêdiyê:** Li bakurê bajêr e. Ew gundê Zêdiyê yê kevin e.

Navê Zêdiyê ji navê pîrozgeha "Şêx Zêd" ku niha li nav mezelê Zêdiyê li serê sirta Xemrevînê ye, hatiye. Pişt re, ew gund fere bû, bû guçe, bi bakur de hilkişî û niha gihîştîye serê sirta Xemrevînê. Şêniyê vê guçeyê qarşiqek ji Kurd, Ereb, Qurbet û Bûdikan e.

- **Guçeya Eşrefiyê ( Qirêc ):** Ew li aliyê bajêr yê rojhilat li ser bêla 'Empêlkê ye. Ew bêla di ber perava rojhilat a çemê Efrînê re berdirêj dibe. Guçe ji dawiya salên şêstî de ji sedsala borî şên bûye. Mirovê ku li destpêkê lê rûnişt, Wehîdê Aşvan ji Gu.Keferbetrê bû. Wî aşekî bi matorê digerî li ber mala xwe ava kiri bû, û bi xwe jî tê de dixebitî.

Eşrefiya niha guçeke mezin e, xaniyên wê li ser rûyê rojavayê bêla 'Empêlkê belav dibin. Piraniya rûniştvanên wê mişextiyên gundên navçê ne, û di karkeriya çandiniyê de dixebitin.



- **Guçeya Qeracê Gêncî:** Ev guçe li aliyê bajêr yê başûr rojhilat e. "Gêncî" navê xudanê qeracê bû ku guçe li ser haitye avakirin. Ji ber ku ew guçe li ser riya gundê.Turundê ya berê ye, ew bi navê guçeya "Riya Turundê" jî tê binavkirin. Xaniyê yekê li derdora sala 1970î ji hêla kesê bi navê Horîkê Kirîf de, li ser wî qeracî hat ava kirin. Li dema Şerê Cîhanê yê Duyem, leşkerên Înglîz avahiyeke biçûk li wir avakiri bûn, û kiri bûn wek nivîsgehekê ji bo xebtandina karkeran.

Guçeya Qeracê Gêncî li ser pesarê wê bêlê ji bakur de berve başûr berdirêj dibe, û niha gihaye gundê Turundê, li vê dawiyê, gund jî ketiye nav sînorên şaredariya bajarê Efrînê.

- **Kolana Bobeniya:** Kolaneke biçûk e, li aliyê bajarê Efrînê yê kevîn, li ber perava çemê Efrînê ye. Pîraniya şênîyê wê Erebên ji hoza Bobenî ne. Berê "bazara dewêr" li şûna wê guçê li dar diket.

Cîghê bajarê Efrînê pir şêrîn e, û heyameke wê ye xweşik heye. "Ferhenga Xaknîgarî ya Sûrî" li derbarê Efrînê dibêje: Ew ji ciwantirîn bajarên Sûryê yên biçûk e.

Bajarê Efrînê navenda kargêrî, civakî û aborî ya navça Çi.Kurmênc e. Di dehsala dawîn de, çalakiyeke ava-

kirinê ye giring li bajarê Efrînê rûdaye. Gelek avahiyên pirasteyî lê rabûne, gelek dukan û xanên kirîn-firotinê yên hêja jî lê peyda bûne.

Bazareke rojane li bajêr heye, berhemên çandinê û pêz lê tên firotan, bazareke hefteyî jî li roja çarşemê


lê tê gerandin, gelek tişt û berhemên navçê lê tên danîn. Bazareke hefteyî ji bo kirînfirotina dewêr/sewalan jî li roja sêşemê lê digere.

Çend karxaneyên bêrîn, sabûn, zêtûn û pêdviyên avakirinê li bajarê Efrînê hene. Meyxana Bozant a çêkirina Meyê, ji sala 1927an de hîn digere. Ji bilî wan, gelek cihên necarî, hesinkarî, koşkarî, durustkirina alavan, makînan û gelek pîşeyên din jî li bajarê Efrînê hene, û pêdviyên şênîyê navçê bi cih tînin.

Bi dehan bijîşk, dermanxane û çar nexwaşxaneyên taybet jî li bajarê Efrînê hene.

Û ji ber ku bi deh hezaran mirovên navçê li bajarê Helebê rûdinin, çûnhatineke pir mezin û bê rawestan di navbera wê û Efrînê de heye. Li gor texmîna şaredariya bajarê Efrînê, hejmara rastî ya rûniştvanên bajarê Efrînê li sala 2006an, dora 84000 kes bû.

1- Xêriddîn El-Esedî: Ferhenga Êlebê... perçe 1, rûpel 172.




Nexşe - 11- Efrîn, devera navend

# Ber bi Pirojeyêke Kurdistanî Isteratîcîk de

*Xelek 1*



Dr. E. Xelîl



H. Omer

► *Dr. Ehmed Xelîl*

► *Wergêr: Heyder Omer*

## **Pirsên dijwar:**

Nivîsîn ne lîstik e, belê ew berpirsiyariya metirsî ye, nemaze jî gava li gel dozên miletan têkildar dibe. Her tiştê, ku mirov dinivîsîne, dibe milkê dîrokê, û mirov nikane xwe jê dawêşîne. Tevî ku ne kêmtirî çel salî bûne, ku ez dinivîsînim jî, min xwe dît, ku bi tirs ber bi lêgerîna du babetan de diçim; yek ji wan kesayetiya kurdî ye, ku di dawiya sala 2009an de bû, û ya din jî ``pirojeya kurdistanî istiratîcî`` ye, ku a nûka dest pê dikim.

Rastî ew e, ku divê lêgerîna pirojeya kurdistanî istiratîcî, ne lêgerîn-

eke ji xwe berê be, ew ji hêla min de, berhema êşêke derûnî, dûr û dirêj e; ji roja, ku ez ji tariya wenda-bûnê rizgar bûm, û min hişyariya xwe ya kurdistanî vegerand, ew cûreyê êşê bi ser hev de kom bû, û hukarî kir, û hîna jî berdewam e.

Bê guman Kurdine din jî heman êş kişandin, û ji heman tariyê rizgar bûn, û heman hişyarî vegerandin. Heya nûka ez bi zimanê wan dipeyivim, û hinek ramanên wan diderbirînim.

Hinek pirsên gewherî bi qirika me digirin, û bersivên hûrbûnî ji me dixwazin:

**1** - Gelo em miletek in, digel hemî wateyên, erdnîgarî, çandî, dîrokî, ku peyva millet di xwe de dicivîne, an em guropên, ku ji hêla rehan û çandan de ji hev cuda ne, lê nîrên cûrbecûr em di erdnîgariyeke hevbeş de hanîne cem hev?

**2** - Gelo me kûrahiya çandî, şaristanî û ciyopolîtîkî di dîroka Rôjhilata Navîn de heye, an em gelê bê reh e, ku bi hêsanî ji nasnameya



xwe tê hilkirin û pişafitin, û ji xweyîtiya xwe tê havî kirin?

**3** - Gelo ma kesayetiyeke netewî ji hêla hizrî, derûnî, çandî û sincî de heye, an em wa gela ye, yê ku nîrên dagîrkirinan ew bê kesayetî û vîn hêştî ye?

**4** - Asta hişyariya me ya komel, ku em hemî yên yek nasnameya netewî û niştimanî ne, ta çi radeyê ye?. Tendurista bîriya me ya netewî û niştimanî, ku çêkera hişyariya komel e, ta çi radeyê ye?

**5** - Li dirêjîya 25 sedsalan me agirê gelek şoreşan pêxist, û gelên ku wek me, di dîroka Rojhilata Navîn de, qurbanî dane, nîn in. Lê tevî vê jî me nikanî welatê xwe rizagr bikira, û dewleta xwe ya xweser ava bikira?

**6** - Pergala kurdistanî, bi dirêjîya 20 sedsalan û heya îro jî, li gor ya milletên derdora me ne, pergaleke awarte ye. Gelo kî berpirsiyarê çêkirina vê pergale ye?

**7** - Gelo em hewcedarên pirojeyeke istiratîcî ne, ku me ji vê pergala havî rizgar bike?

***Dûrî lîstikên iblîskirinê:***

Ev hinek pirsên gewherî ne, bi riwê me de derdikevin, û berpirsiyariya mirovan e, beriya ya netewî û niştimanî, divê bibîne, ku em bi wêrekî pê re bidin û bistînin. Me di xalekê de weha li hev kiriye, ku em hemî berpirsiyariyê hildin ser milên siyasetmedaran. Êdî rê bidin, ku ez du zanyariyan bînim bîriyan:

Zanyariya yekem: Awayê paqijkirina ji şer, di efsaneyê pêşiyên me (Horî) de, bi (Nukkeşî), ku beramberî peyva kurdî (Nexwesî / Nexoşî) ye, dihan navendin. Olperestê wê demê sê perende digirtin, gunehên gel hildida ser wan, û ji dêvla gel dikirin qurban, û ji bo xwedayê cîhana jêrîn (dojeh) verê dikirin(1).



Ev yeka li ba îbramiyan hate gushetin awayê (Nêriyê şaşiyê); olperestê wan gunehên gel hildida ser nêrî, û serjê fikir, an jî bi çolê de ber dida. Û di pey re jî ev yeka hate guhestin awayê (Beranê qurbanê), yê ku xweda ji pêximber Birahîm re şand, da bike qurbana Îshaq, li gor hewalên Tewratê, an jî qurbana Simaîl, li gor piraniya hewalên Îslamê(2). Heye ev gene ew be yê ku (Ehrîman / be-ilzubol / iblîs / şeytan) di olên Zeredestî û Cuhû, û Xistiyan, û Îslamê de çêkiribe.

Gelo eger em rola siyasetyemedaran bixin şûna rola (perendeyê şaşiyê, nêriyê şaşiyê, û iblîs) û xwe jî ji guneha buşûn, dê wê realîte û dadwerî vê yekê bipejirînin?

Zanyariya duwem: Dana gundek e, li bakurê Sûriyê ye bi ser parêzgeha Idlibê ve dikeve, ev gund bi çekûzî û kêmbûna avê navdar e. Mamosteyekî zangoyê, ku ji xelkê wî gundî ye, bi awayê henekan got: Carekê xelkê gundê me biryar girtin, ku xwe ji rengêra çekûzîye rizgar bikin, bi vê boneyê xelkên gundên derdorê vexwendin xarinê. Her

kesekî ji xwe berê bawer kir, ku kesên din wê goşt, birinc û rûn û tiştên wisa bînin, êdî ew jî avê, ji ber ku kême, bi xwe re bibe. Roja ku çûn ew cihê nîşankirî, dîtin ku hemiyan av bi xwe re aniye, vê lomê ew navê çekûzîyê li ser wan ma.

Xuyaye hinekên me wek xelkên Dana tev digerin, ewana ji bo welatê me yê dagîrkirî dêş in, û çavên wan li Kurdistana xweser e, lê di heman demê de destan ji hinek berjewendiyên xwe ber nadin, û weha bawer dikin, ku divê kesên din ji bo welêt bixebitin, bikevin zîndan û êşan bikîşînin. Va ye em encama vî cûreyê tevdirê dibînin; Kurdistan dagîrkirî dimîne, û em jî di destên dagîrkeran de dimînin.





***Ber bi rexnekirina xweyîti ji hêla netewî de:***

Gelê me! Kînga em dê zanibin, ku aloziya me, li Rojhilata Navîn, ya herî pir girêk e? Kînga dê em zanibin, ku bi dagîrkerên xapînok û dirinde re rû bi rû ne? Kînga emê zanibin, ku ewana Kurdistanê wek diyarî nadim me? Kînga em dê zanibin, ku çewtî ne tenê ji hêla hin rewşenbîr an hin siyasetmedar an hin xulmaş an hin xwefiroş an jî hin xinizan de ye? Kînga emê zanibin, ku çewtiya me bingehîn e, çewtiya bîrî ya komel e, çewtiya ageh û hişyariya komel e, çewtiya xwenaskirina komel e? Kînga emê zanîna van tiştên derbas bûne hemiyar bi ageha resen, helwesta mirovbend, rama aferîner û têkoşîna ji dil biguherin?

Gelê me! Em pir hewcedar in, ku bi jîrbûn li xweyîtiya xwe vegerin, bi wêrekî xwe rexne bikin, em bîriya komel dubare durist bikin, û hişyariya komel dubare ava bikin, ageha komel, nirxên niştimanperwerî dubare biçespînin, têgeha xwenaskirinê serast bikin, hesta berpirsiyariya netewî ber bi pêş ve

bibin, û xebata tevahî bixin warê piratîkê.

Belê ... divê em van tiştên derbas bûne, bi lez pêk bînin, em di Rojhilata Navîn de ne, ev devera ku xwe diyên hizrên talankirinê û dagîrkirinê li ser destladar in, ewana alavên xwe yê dirinde û xapînok her ber bi pêş ve dibin, û bi awayê aşkere radigihênin, ku hebûna Kurdistanê napejirînin. Em di cîhanekê de ne, ku hêzên mezin destên xwe dane ser, û tenê zimanê berjewendiyar bi kar tînin û têdighînin, tenê rêza hêzdarên digirin. Em bi demê re di cirîdê dene, eger em semtên têkoşîna xwe serast nekin û bi pêş ve nebin, neviyên me dê nikanibin di dewleta, ku navê wê Kurdistan e, de bijîn.



Di van lêkolînên, ku wê bêne de, bi qaserî dizanim û dikanim, ezê hewl bidin, ku di lixwevegerînê û rexnê de hevpar bim, û pirojeyê kurdistanî isteratîcî pêşniyar bikim, û di heman demê de dupat dikim, ku tevahiya rastiye ne di destên min de ye, lê em hewcedarên bihukarîkirina hişê tevahî yê millet in.

Gava ez van lêkolînan pêşkêş dikim, ne ku dixwazim kînan û perçebûnan biçînim, û ne jî kesekî an partiyekê bipesnim an jî riswa bikim, û armanca min jî ne ew e, ku vir û vûtan bi kesan ve girê bidim. Belê dixwazim mûmekê di navenda tariyê de vêxim, û bi qaserî dikanim û dizanim rastiyan bêjim, û deynim pêşiya millet. Û di van hewildanan hemiyan de jî hêzê ji gewreyên me werdigirim; ew gewreyên ku ala têkoşînê bilind kiribûn, û êş û azar kişandibûn, bi mêranî li bin sêdaran rawestiyan û bûn cangoriyên millet.

Dawî, ez sipasdarê her du dostên xoşewîst Es-ed Qeredaxî û Heyder

---

### **Jêder:**

(1)Jîrnôt Wîlhêlm: Horî, rû 133, 134. Fadîl Ebdil-Wahêd Elî: Min Somer île EL-Tewrat, rû 154.

(2)El-Kîtab El-Muqeddes, El-Ehid El-Qedîm, sifir El-lawiyyîn.E-Ayat9 -11- 21 – 22.

Omer dikim, ku yê pêşî ev xebata min bo kurmancî; zarava basûr, û yê din jî bo zarava bakur wergerandine. Û çî dibe jî, bila bibe, divê Kurdistan rizgar bibe.

*Elmanya. 02. 01. 2014*



# Mem Med: Evîn Bi Xeyala Nayê Pînekirin



*Hevpeyvîneke taybet ligel helbestvanê Kurd Mem Med û nêrînên wî li ser huner û çanda Kurdî û girêdana berhemên helbestvanan bi cîwar, xak û zemînê re.*

*Lê berî em dest bi hevpeyvînê bikin divê ku em bi-hêlin helbestvanê hêja xwe bi xwe bide naskirin:*

## ► Hevpeyvîn: Parêzer Edhem Şêxo

### - *Nasnameya helbestvan?*

Ez ji bajarê Bazîdê me, û li wir çavên min gerdûn cara yekê dîtiye. Navê gundê me Ortilî ye. Ev gund li hêla qontara Çiyayê Agirî ye, zaroktiya min tev li gund hat bihurandin, paşê xwandina navîn min li Bazîdê domand û li Îzmirê qedand û ji salên zanîngehê û vir ve ez li Stembolê dijîm. Min xwendina xwe li zanîngeha Marmara beşê hiqûqê qedand û niha jî ez karê parêzeriyê dikim, û li nik karê xwe yê girêdayî parezeriyê ez bi wêjeyê re jî têkildar im.

**- *Pirseka xwe dide pirsîn, ma gelo çima te berhemên xwe bi nivîsîna turkî dest pê kir, û di dû re te bilez berhemên xwe bi zimanê zikmakî dest pê kir?***

Mîna gelek herêmên Kurdistanê li bakurê Kurdistanê jî me bi neçarî ne bi zimanê kurdî, bi zimanê desthilatdaran dest bi dibistanê dikir. Herçiqas li malê xwendina me bi Kurdî ba jî, lê li seba qedexebûna zimanê kurdî ser metnê bi tirkî bû. Têlevîzyon, radiyo û rojname hemû bi tirkî bûn. Dema weha dibe di hêla nivîsê de mêjî, hişmendî bi ser tirkî de diçe.

Dema rewş weha be tu xwendina xwe a ramanî û hestî hemî bi tirkî dikî û nivîsandina tirkî mixabin hinekî resen dibe. Ji ber ku xwendina min a seretayî heya zankoyê hemî bi tirkî bû. Heya paşê bi min re hişmendiya netewî çêdibe

hasil bû. Min êdî bi zimanê xwe xwend û nivîsî. Tabî ferhenga min a Kurdî heya ku astê destûr da ez bi kurdî binvîsim. Ez hê jî li pey xurtkirina wê ferhengê me. Kengê min bi xwendin û xebatê kurdiya xwe bêhtir pêş de da, min zêdetir bi kurdî nivîsî.

**- Ma hîn tajanên nivîsandina tirkî xwe li te digrin, an tenê bi kurdî binivîsî?**

Bi rastî hîn pir belge û reşbelekên min ên wek çîrokî û ceribandînan bi tirkî hene, lê tu nêta min tuneye ku ez lê vegerim an çap bikim, û heya ji min tê ezê tenê bi kurdî wêjeyê binivîsim.

**- Ma bi Kurdî tenê tu helbestê dinivîsî, yan tu di cureyên din de jî dixebitî?**

A niha, vê gavê pirtûkeke min ji çapkirinê re amade ye, û wê di nêzik de were weşandin. Ji ber ku li ber destê edîtorê de ye, û ji bilî wê li ser romanekê dixebitim. Dîsa hîn pirojeyên min ên din jî hene. yek jê bi bîranîn û serboriyên malbata min ên Serhildana Agirî û Mihabadê ve girêdayî ye. Ev xebata dawî bêhtir bi nivîsandinên dîrokî û sisyolojî ve girêdayî ye, û ew bi xwe bi zimanê

Kurdî ye. Ez dixwezim di demeke nêz de wê biqedînim.

**- Li gorî xwendina me ji herdu dîwanên te re (Janistan û Berdin Bila Tarî be), me dît ku tu bandora helbestvanên kilasîk wek Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî yan Feqiyê Teyran li ser helbestên te nînin, ma tu di gulistanên wan re derbas nebû, yan te nexwast ku tu di bin hilma wan de bimînî?**

Wek me berî vê got, ji ber ku xwendina me ji zaroktiyê de ta asta zanîngehê bi tirkî bû, û şopandina çand û helbestên biyanî jî yên wergerandî tev di riya zimanê tirkî re bûn, ji ber wê belkî bandora berhemên kurdî yên kilasîkî li ser nivîsandina min kêmbû. Ji ber ku min berhemên kurdî Kilasîk dereng xwendin, tevî ku min Xanî, Cizîrî û Feqiyê Teyra jî tev piştî demekê xwendin, lewre helbestên min bi teşeyekî modern hatine nivîsandin.



Bêguman ez xwe dorpêç nakim û tu reng ji rengên nivîsandinê bi carekê li xwe zor nakim, û nivîsera min xwe bi çi awayî bavêjê holê ez wanî dinivîsim. Helbet ez jî, li gorî dilê xwe, li pey bedewiya teşeyekê me.

**- Di dîwana (Berdin Bila Tarî be) de, tu di kurte helbesta mirî û mirin de şîretên Îsa mesîh tînî bîra mirovan gava ew helbest di berçavan re dere. Ma ew ji çanda ku tu li ser ava bûyî hatiye ba te, yan baweriya te bi şîretên pêxemberan tê?**


Ew helbesta Mirî û Mirin, bi rastî bi zanebûn ne telmîhe ke. Ji xwe ew gotin bûne pariyek mejiyê hevpar. Ew gotinên pirtûkên pîroz in jî, yanê şîretên pêxemberan e jî. Ez dikarim bêjim min jî wek wijdaneke, îdealeke hevpar ew riste dane hev.

**- Di helbesteke xwe de, te pir wêneyeke balkêş bi kar aniye gava tu dibêjî: (Dil bê pê ne bi bask in). Ma gelo çima te di wê astê de pir helbest di dîwanê de nehûnamdine?**

Tiştê eşkere heye ku ew jî teşeyê helbesta min a modern e.

Di pirtûka min a yekemîn de hel-

bestên wek **dil bê pê ne** zêdetir in. Pirtûka duyemîn (Janistan) her çiqas bi gelek navan hatibe nivîsandin jî, sê paya du payê wê wek yek helbestek e. Ew jî jana êşa welêt e. Helbêstên din jî êşa û takeksên wê ne. Her çiqas kêm bin jî, di dawîya pirtûkê de çend hebên nêzî wê dîsa jî hene. Çawa min got ez bi teşeyê û forma xwe dorpêç nakim. Dîsa ez di wêjeyê de rûniştandina şêwe û girêdana teşeyekê jî naporêzim. Bi tenê hîn pêşdeçûn, hîn bedewî ye tiştê dikarim bêjim ez diparêzim. Çi form û şêwe dibe bila bibe. Heya ez bêjim rûniştandina teşeyekê û formekê jî dawîhatina têgiştina nivîskar e jî bêhtir a helbestvan e .





**- Tu di helbestekê de dibêji: (Evîn bi xeyala nayê pînekirin) ew jî tê wateya ku te lingên helbestê ji zemîne neqetandine, gelo ma ew tenê wêneyek bû bi ser asîmanê helbestê de barî dema nivîsandinê? Yan bi xwe ji bawerî û ramanên te tê?**

Gava ez xwe li helbest û nivîsên xwe yê pexşanî dinêrim piyekî wê li ezmanan be jî yek li ser erdê be, yan jî ji xwe re li zemînekî digere. Helbet nêrîna herkesî curbecur e. Lê ji min re heger çi dibe bila bibe, hest be jî, surelîst be jî zemîneke mantiqî di nivîsên min de heye. Eger dijî mantiqê be jî, mantiqê yanê tersa wê divê bîr bîne.

**- Ji demeke dirêj ve kurdên bakur di bin ne tenê qedexa siyasetê de zehmetî dikşandin, lê ew bûbû rewşeke gelemperî û hemî şaxên huner û çandê jî di wê rewşê de demeke dirêj, û tevî wê çanda kurdî nemir lê hîn em Karin bibêjin hîn geş bû tevî astengiyan, lê niha tevî ku derfet pir in, dîsa jî rewşa çand û hunerê ji berê ne çêtir e?**

Bi rastî belkî yê dinivîsin ne hindik bin jî, lê xwendevan pir kêmtir in, ji ber ku di serî de, hê jî li Bakurê

Kurdistanê fêrbûna zimanê Kurdî qedexe ye. Hem Bakurê Kurdistanê hem jî Kurdên belayî hundirê Tirkiyê bûne bi saya TV û Netê di demên dawî de bêhtir girêdana wan û zimanê wan lawaz bûye. Ne tenê bajarên Tirkiyê, bajarên Bakurê Kurdistanê jî mixabin zimanê kuçe û kolanên bêhtir êdî bi tirkî ye. Di vir de fêrnebûna zimên a bi riya dibistanan û nebûna zimanê dewletbûnê û axirî bi berjewendiyaya kesayetî ve girêdayî ye. Çimkî bi sawa zimanê kurdî nabin xwedî kar û statu bi dest naxin. Heta zimanek nebe zimanê desthilatdariyê yanê nebe zimanê dewletê û xwendina wê neçarî nebe, û bi wî zimanî riya aboriyê venebe rewşa wî zimanî zehmet e. Li Bakur kî xwendekar û nivîskar jî heman kes e. Hema hema rewş weha ye.



**- Hûn wek nivîskar di vî warî de çi guhartinê kanin çêbikin? Ji bo hûn karibin riwê nîşên nû ji Kurdan berve çand û xwandina kurdî bikin?**

Kêşeya mezin ew e, ku bandora alavên ragihandinê û miltîmîdye li ser welatiyan ji hemî aliyên din zêdetir e, û wek tê zanîn hîn mîdya kurdî û alavên raghandinê yên ku bi kurdî weşanên xwe dikin, ew nikarin guhdar û temaşevanên Kurd rakîş bikin, an bihêlin ku wek çawa bi tirkî alavan dişopînin, wan bi kurdî jî bişopînin, ev di warê gelemperî de. Bilî wê ku em çêrî hînbûna xwendin û nivîsandinê yên zarokên Kurd bikin. Hê jî zarokên Kurdan bi neçarî tenê bi zimanê tirkî hînî xwendin û nivîsandinê dibin, û ev jî hem wan ji zimanê kurdî dûr dixê, hem jî hişmendiya Kurd ji Kurd û Kurdistanîyê dûr dikev.

Li ser bingeha çand û zimanê tirkî tîn tîmarkirin ji qonaxa zarokîyê de heya mezin dibin, û dadikevin hola kar û xebatê. Birastî; di hêla zimên û hişmediya kurdî de rastî piroblemên mezin tîn. Ji bo vê divê

dezgeh, partî û rêxistinên Kurd tev bi hev re rabin, çimkî çand û zimanê kurdî di metirsiyê de ne. Divê ev aloziyên mezin werin çareserkirin û desteserkirin. Eger kî çi dike divê bike ji bo zimên her Kurdek berpirsiyar e.

Helbet bandor û derfetên dergeh, dezgeh û rêxistinên hîn zêde ne. Barê berpirsiyariya mezin li ser milê wan e. Dîsa dubare dikim, ji bo Bakur divê misoger di dibistanan de ji bo zarokên Kurdan fêrbûna zimên neçarî be. Yanê zimanê zanînê bi kurdî be. Divê ez vêya jî bêjim; divê tu Kurdek nebêje ez çi bikim, derfet kê im. Ez jî hîn bûm û pêşde birina zimên dev jê berdidim. Em ji bîr nekin ku yên ziman qedexê kirine armanca wan jî ev e. Em jî xwe bavêjin pişt zehmetiyan û dev ji zimên berdin wê çaxê emê neyarên zimanê kurdî bextewar bikin.

Ya dawî ez li Rojavayê Kurdistanê ji weşandina kovarên kurdî yên huner û wêjeyê re kêfxweş im. Di vî karî de ji kovara Pirsê re serkeftin û spasdar im.

**- Stembol -**



# Goristana Deriya yê

► **Mihemed Qere Hesên**

**E**z îro, li serê sibê zû ji xew rabûm, min tu xew nekir, gewdê min tibê ketî soq û hatî kutan. Ger fiqaqîkê di xew ve biçûma, pîrkabûsk li min sîwar dibû, dibû fix, fixa min, ez difetisandim, ez xişîxişî bûme, hema, hema dê goştê min ji hestiyên biweşe. Heya sibê ez di mixiltiya kurê xwe Rodî de me. Dahol û dîlan li bere deriyê me digerî, Rodiyê min di serê dîlanê de bû. Şer û şor di zemewendê de çê dibûn, kêr dikşandin hev. Bûk ji nû ve digerî diçû mala bavê xwe. Ez jî sil û hêrs dibûm, ku hêj lawê min bi bûka xwe şa ne bûye, xeydiye.

Ji ber vê gelşê, Rodiyê min pir bi jan bû, jana xwe jî zaf bi jehir bû; ji ber jehriyê serê xwe radikir bi welatê biyaniyê ve diçû.

Diya Rodî xewna xwe weha, ji famîla xwe re şirorve dikir.

Ez nizanim çima îro dilê min goştê masiyan dixweze? Û çima serdîne? Min di jiyana xwe de, ji



qutiye serdînan ên gemirî hez nekiriye û tucaran min nexweriye! Dil û çêja min xav bûne! Devê min tehil bûye zirîçk. Ka qutîk serdîn ji min re wînin, belkî xavzariya xwe bişkînim û xweş bikim.

Famîlê sifra xwe amade dikir û li ser tepirê datînin, li dorê kom dibin. Gava dê qapaqa qutiye vedikir, ji nişka ve tehrê Rodî yê hestî, nola zumbelekekî ji qutiye xwe çedikir derve û li ser tepirê dilutîkî. Lê kesên li dor tepirê kilor rûniştine, xwe bi şûn de çedikirin. Rodiyê hestî bezî destên diya xwe maç dikirin û digot: Dayê min pir bîra te kiriye, dûrbûn ji te, jiyana tehl û tîrş e. Bê çêj û xweşî ye û ...



Gava dê ew dîmen dît, tavi lê bû kevrê bûk, li devê geliyê Tîran, ji rêwiyên diçûn û dihatin re çîvanoka xwe hewal dida.

Piştî mawekê Rodiyê hestî, li ber kevrê bûk digerrî, ew giran, giran dibû nermele û ziman mîna marmarûşkan di dêv de digerrî.

Kurê min çi bi serê te hatiye? Çima tu tazî bûyî zumbek, wek çirtan hildipekî?

Rodî: Dayê aram be, ezê çêroka xwe ji te re hewaldim. Dayê tu zanî, gava em ji malên xwe revîn û me hemî tişt li şûna xwe hêştin, hawîra me giş bû gola xwînê, û bejna alafên li qatên ezmên diketin. Deriyên zemînê û ezmên li ber me hatin girtin û kilîtîkirin, û dewletên mezin kilîtên çareseriyê jî daqirtandin. Bilî şivêla penaberiyê li ber me vekirî nehêştin. We ew qurşên spî ji rojên reş re veşartine, dan min ku pê

herim penaberiyê. Lê dayê, ez çiqas bi rê de westîm, êşam û min ret bûn dîtibû, mixabin ew bazirganên mirovan derbas dikin, ji hemî rewiştên mirovan e şuştî ne, bes peran dizan û nas dikin.

Piştî em hosan kirin û kerisandin, îro, siba em dibirin û tanîn, weha soz dixwerin, li soza dawî em dora dused kes li keştê sîwar kirin, weke ku refê pelweran li ser hejekî nîştin û ciyê piran jî tunebûn, li ser piştî hev nîştin, çi zaro, çi ciwan, çi jin û çi...Ew keşt bi giranî di ser rûyê deriya Sipî re digizdirî, mixabin deriya Sipî çiqas navekî xweş e!

Em ji peravê bi dûrketin, lê avê dida lêv û kenarên jorîn, hema, hema dê têteta û noq biba. Dayê rûyê avê çiqas dûz, xweş, şîn û şêrîn bû, fere bû, çiqas çavên te bi dîtana ewqas dûr fere bû, bê paşî bû, mirov çiqas bi wî dîmenî şadibû, vedihesî...

Li destpêkê sarbayê hênîk û xweş dihat, can bi miriyan tîna, bi meşa kusefisî ya keştê re, sarba pêşbirkî wê dikir û dibezî, dibezî ta dibû bapeşk û bahoz, xwe li nava me dixist, desmal û kum ji serê bînekan difirandin.

Keşt weke serxweşekî virde wêde diçelqî, geh bi ser hêla çepê de, geh jî bi ser a restê de xar dibû. Her çû nikanî terezûya xwe bigirta, serî li kûnê diket. Bi wê kefleftê re qêrînên têvel ref bi ref ji devên pizdonek difirîn qatên ezmanan. Lê mixabin guhên Xwedê û dewletên mezin hatibûn girtin û şimakirin.


Tê xuya wê şevê Ano û Enlîl ji hev xeydîbûn, û Enlîl kîna xwe di serê wê keştê re derdixist, destê xwe dirêj dike binê wê, nola zerkekê dernexûnî avê dike, kesên têde weke kurmikan ta bi ser avê dikevin xwe dirêj û kom dikin.

Dayê mixabin kes bi hawara me nehat, tevî ku me çiqas fîxan kirin. Em bûn taştî, firavîn û şîva çilk cinawirên avî, dayê wan ez şilf tazî kirim, rûmeta me tevan şikandin. Ji ber wê ez destên xwe didim ser guhên xwe û ...ku wan veşêrim lo-ma ji te fedî dikim. Deriya bû goristana me, goristana bê kêlî, bê edrese, kêlikên tirba me yek alafa Sûriyê bû ya din jî pêla deriya Sipî bû. Deriya ku berî we bi çend katan ez bengiyê bûme, wiha bi serê me kir. Deriya sipî bû " tarîderiya ".

Di pişt re awciyên masiyan kemendên xwe avêtin deriyê û ez bi ber wê ketim. Ez bi masiyan re çûm fabirîka masiyan, di hemî rêçberhemên wê re çûm, ta ketim qutiyê, qutî bû mala min, bû welatê min î sermed. Şansa min hebû, ku dîsa vegrîm ba te, dayê tu ji min re bûyî destpêk û dawî.

Gava dê çêroka lawê xwe bîst, devgezê bi ser Rodiyê hestî de ket û mir, û ew jî di bin xwe de fetisand.

20. 07. 2015.



# Pêlava Rişko

► Osman Îso



**Z**ivistan e hestiyên zemînê diliklikin ,û diranên çiyân diçikçikin, Rişko di nav ramanan de çep û rast dizîvire, winda û dudilî bûye ,Soba êzingan, û Soba mazotê hişê wî birine ,û her du jî gelek buhan e, tonek êzing bi 30000 î ye ,û bermîlek mazot bi 45000 î ye , û mûçeya Rişko 25000 in . Dilê Rişko êzingan dixweze û naxweze, ji ber ku piraniya êzingan karê diziyê ne ;firoşkarên dizek dilê daristanan dibrin,û li çarşiya reş difroşin , û bi serkeriya xwe kezeba herêmê dibrin , û hêdî hêdî herêmê dikojin. Bermîlên mazotê jî pîsk bûne ,û herdem nimêja xwe li dar dixin ji bo dorpêçkirin peyda bibe ,û gava lavêjên wan bi cîh tên , û dorpêçkirin rêşiyên xwe ber dide , bermîl

dîlana xwe li dar dixin û awê berçepkî direqisin û ber ve embaran direvin û dibêjin:( xweda ! Tu me ji mûşekan biparêze .) .Êêê bermîl jî bê sincî bûne û çavên wan herdem li berîka millet in . Bermîlên pîsk û pufik; ji xwîna millet qelew bûne.

Bi ser kul û derdan de pêlavên Rişko qul bûn , û ji hev ketin .Ev çi bela bû ?!! .....Koşkar bibû dost û hevalê Rişko , pêlavên Rişko ji riya diçû cem koşkêr şerm dikirin, koşkêr pêlavên Rişko li ezber kiribûn ,ji nûjenkirina çerm û kerikan her pêlavek bibû lîtirek. Rişko bi xwe re daxive û dibêje :( Çareseriya şer wê hebe ,lê çareseriya dirûtina pêlavên min nema ,ez neçar im pêlavine nû bikirim !! ). Roja Çarşemê bazar e ,Rişko yê reben bi mirûzekî tirş li riya bazarê sîwar dibe , lê def û dîlan di sere wî de digerîya . Rişko gîha Efrîna rengîn û di pêşî de dizanî bi bihaneya dorpêçkirinê nexên her tiştî buhaye ,û dilê bazirganan ji pola ye,



Rişko dest da ser dilê xwe û ber ve çarşiyê meşî , te digot qey ew ber hovekî xwînvexwer ve diçe . Dil Rişko ber firoşgehên nû ve dikşand , lê hişê Rişko digote wî : " Qurbano ! Ez benî firoşgehên ( balê )Efrîn dagîrker kirine û piraniya cil û pêlav firoşan biyanî ne , Rişko tu yê bê fedî bazarê bi wan re bikî ,û perên xwe hindik , û tiştên xwe rindik ."

Rişko windayî bûye , gavekê ber cil û pêlavên nû ve davêje , û du gavan ber cil û pêlavên ( balê ) ve davêje , li orta çarşiyê û di navbera du riyên de lingên Rişko - mîna tevgera Kurdî- bi ber hev ketine . Lê li dawiyê Rişko biryarek stand û got : "" Hevjîna min kul ,êş , û encamên şer yên ne baş tev min par vekirin , û divê ez dilê wê şa bikim û pêwîstê di va zivistana tund û tûj de bi pêlavên nû germ bikim .""

Rişko derbas firoşgehê dibe ,zok pêlav nerxên wan 2500 lêre ye

berîk û çavên Rişko kişandin. kenekî perîşan û por sipî di gewriya Rişko re hêdfî hêdfî hildikşe ,û lêvên wî yên miçqî geş dike ,û xemgîniya salên şer ji ser ruwên Rişko difrîne ,destên Rişko ji eşqa re xwe davêjin berîka wî , melevaniyê û nêçîra xwe dikin ,pênc hezarî digirin û nazik nazik û bi serbilindî derdixin û datînin ser masê . Rişko bi xwe re dibêje : "" Erêêê erêê pênc sal reş ji temenê me derbas bûn.Îro ezê dilê hevjîna xwe vejînim , û ruwê wê bi kenekî şêrîn bixemlînim. Ka dibêjin : Buhabûn buhabûn guhê me kirin sûzek bi peyva buhabûnê , Rişko yê min tu jî kêf ke û toza qisawetan îro ji dilê xwe dawêşîne ."".

Rişko : Kurê min , delalo ! Va ye zok pêlav têxe tûr , û pere li ser masê ne . Solfiroş peran dijmêre û dibêje : Apo te şaşîftî di jimartinê de kiriye , zok pêlav bi 25000î ye , belkî te zîro ne dîtî bû?! Rişko : Te got bi çiqasî ne ?!!!! . Devê Rişko mîna şikeftan matmay ma, gewriya wî zûwa bû ,çavên wî melûl bûn, kabên wî sist bûn te digot qey wî sîlak ji nişke ve xwerî , yan satileke avî sar bi ser serê wî de hatiye boşkirin .



Rişko bervajkî ji firoşgehê derket ,bîhneke kûr û dirêj kişand , dunya li pêş çavên Rişko bi gavên giran sayî bû . Mala zîro bişewite , xaleke biçûk e , lê di va cenga malwêran de dilê Rişko jar kir , û hêviyên wî pûç kirin .Rişko bi xwe re daxive û dibêje : "" Ziro !!! Çima te wekir ???! Te meraqa min ruqiçand , çima tu ji mûçeyan herdem direvî, û dikevî ser pêdiviyên rojane ???!! Tiştên biçûk, kesên biçûk , herdem şahiyê ji dilê mirov digron , lê ez dest vala venagerim mala xwe . "" . Li ser rîya vegeerê zarokêkî gulek sor diyarî Rişko kir , û destê Rişko yê vala bi gulê fodil kir . Zarok bi Rişko re kenî ,û ber ve çarşiyê çû , gulê û kenê zarok ,êş û xemgînî ji dilê Rişko şuştin ,û pên wî yên tewşankî serast kirin.

**EFRÎN -4 /12 / 2015**

# SEMBOL

**Helbest:** *Baranê Cûmê*

Min tu kir zarok...  
 Xwestin  
 Hêviyên te bikojin...  
 Kargeha lîstokan  
                     rawestandin...  
 Min tu kir gul...  
 Reng û bihna te  
 Serî êşandin...  
 Av....  
 Ji ser te miçiqandin  
 Min tu kir ronahî...  
 Deriyê zindanan  
 Dê bişkînî...  
 Çivîk...  
 Perwan...  
 Ê suriştê..  
                     Azad bikî...  
 Min tu kir SEMBOL...  
 Xwestin  
 Te ji min bidizin...  
 Li laşekî tazî  
                     Ê beravêtî kin...  
 Lê....  
 Bi pertewên xwe  
 Te ew kor kirin.







# Solînên Xoyê

**Pexşan**

*Merwa Birim*

Bi qîjeqîja refên newresan re hiskînî bi keştîyên deryaya Sipî ket, bişkovkên miltanê şîn bişkuvandin û werîsên xoyê pişt Stenbolê xurandin.

Xortetekî çardeh salî, di siha dareke guvîjê de, li nêzî peravê derdê welatê xwe li ser qûma rûtirş bi lîliyên xwe nîgar kir... Bê qalîqên bajarên hilweşandî nîşan kirin.

Gotina mamoste dema digot: Şagirtino..! hûn dizanin ku kulîkên berfê jî hene? Wî anî bîra xwe.

Bi wê gotinê re, çavên robarên hêviyan herikîn, û wî digot: Ax welato.. Ezê riya kadizê bikim berbiska şevên te, û şivantiyê ji pinpinîkên penaber re bikim....Bila hênikiyê ji kulîkên berfê binoşin.

Ezê di ser sibehên melûl de xunavê biweşînim, û çîrokên koçberiyê bişewitînim.

Ax welato.....

Ezê li qadên mirinê ala jiyanê hildim.

Pêleke dîn êrîş da sînoren nexşeya welatê bê guneh, û ji bin de hilweşand.... Pêlên coşê di dilê biçûk de hêz vejand, berve dînokiya deryayê bezî û bang kir: Ey deryaya Sipî.. perspana nav welatan..!

Tu bûyî Bekoyê Ewan, lê emê vegerin.

Bi vedenga banga wî re, aso veciniqî û ta kete nava demê.

Her ku tamar di zendên pêlan de bilind dibûn, wê kefkopik tife peravê dikir. Banga wî bilind dibû û solînan xo ji tîrêjên sibehî dibişkuvandin û dimêtin.

Ey deryaya Sipî..! Emê vegerin.

# Kenê Berbangê

*Îlham Osman*



Di bin sîwana şevê de  
nepîrçekên xewnan  
hin rengên  
tabloya kenê min  
ê veşartî didizîn  
lê nikanîbûn  
ez ji mîvandariya  
buhîştta evînê  
birevandin bidama.  
Di çavên min de..  
kevokên mereqan difirîn  
di gulistana sîngê hêvîdar de  
sosinan semînarên evîndariyê  
li dar dixistin  
û beyarên ciwaniya te  
li min pîroz dikirin.

Hêviyên veşartî..  
çîrokên xwe  
bi mitêla gulgulî re  
parve dikirin  
Carina jî...  
bi rengê şevê re  
kenê stêrkan bîrve diçûn  
awaza tavên baranê  
şev dikir xewê  
û di çavên min de  
xew hişyar dikir.  
Pênûsa dilgerm  
dêmên rûpelê radimûsandin  
ew bi helbestekê serxweş dikir  
berî ku..  
kenê berbangê  
siruştê serxweş bike  
helbesta min  
berbang dînok kir

# Li Wir

*Yûsif Îbîş*



Li rawestgehê  
ew giştî li hêviya sibê ne  
pir bi coş in  
lê..  
tarûmar in  
nizanin ku li aliyê şaş sekinîne.  
Bavekî  
destê keça xwe girtiye  
dê bigihîne dibistanê  
qet nizane  
ku hêla din  
wan li hember  
dergeha gorsitanê peya dike.  
Geştiyarek  
ew jî mîna hemiyan

li rawesgehê sekinî  
dixwaze..  
serdana taxa azadiyê bike  
lê nehat serê wî  
ku ew li aliya şaş e  
li aliya koça dawiyê ye  
li riya koçberiyê ye.  
Nêçîrvanek  
ew jî li wir e  
bi tîr û çek e  
lê nizane avjeniyê bike  
pir caran ew diçû daristanê  
xewna xwe nêçîr bike  
lê vê carê  
ew çû deryayê  
xewna xwe bikuje.  
Li wir  
li rawestgehê  
ew hemî tî û birçî ne  
ew hemî winda ne  
ew hemî Kurd in .....

**Di Nivsandina Zimanê Kurdî De**

Di nivîsandina zimanê Kurdî de, tîpên gir di van rewşan de bi kar tên.

- Tîpa yekê ( pêşîn ) ji serenavan.
- Tîpa yekê ji destpêka hevokê.
- Tîpa yekê ji navên rojname û kovaran.
- Tîpa yekê ji navên Gund, bajar, tax, hemî cihên xaknîgarî û cihên pîroz.
- Tîpa yekê ji navên meh, demsal, roj û cejnan.
- Tîpa yekê piştî xal, cotexal, pirsnîşank û matnîşankê.
- Eger mirov bixweze balê bikşîne ser bêjeyekê hemû tîpên wê bi gir dinivîsîne. Û di kurtkirina bêje û navên sazî, deste û rêxistinan de jî bi gir tê nivîsandin.

--- --- ---

Taybetmendiya hin tîpên kurdî di nivîsandinê de.

Di nivîsandina zimanê Kurdî de du tîpên dengdêr di bêjeyekê de nagînin hev, ango li pey hev netên, û eger gîhane hev:

A - Tîpa dengdar a girêkok ( y ) dikeve navbera wan, yan jî dengdêrek ji wan herduyan dikeve, û yek dimîne, yan jî herdu tîp bi dengdêreke din tên guhartin.

B - Eger tîpên dengdêr ( î – ê ) ketin pêşiya tîpa dengdar ( y ) ew bi tîpa dengdêr ( i ) tên guhartin.

C - Eger tîpên dengdêr ( û - u ) ketin pêşiya tîpa dengdar ( w ) ew bi tîpa dengdêr ( i ) tên guhartin.

**Ferhengok:**

- |  |                              |
|--|------------------------------|
| - Derûn: نفس                           | - Bilinbînî, azwer: طموح     |
| - Rûgeş: باسم                          | - Berçav: ظاهر               |
| - Bejavî: برمائي                       | - Behredar: عبقری            |
| - Mizgînî: بشارة                       | - Pêşenûs, daxwezname: عريضة |
| - Paşxistin: تأجيل                     | - Seza: جزاء                 |
| - Desteberiya civakî: الضمان الاجتماعي | - Regez: عنصر                |
| - Lamij: طفيلي                         | - Nişkekuştin: اغتيال        |

# Pêkenok



- Mamoste ji şagirt pirs kir: Hêk nêr e, yan mê ye?

Şagirt got: Eger çêlika di hêkê de mirîşk be, hêk mê ye, û eger dîk be, bêguman hêk nêr e.

Mamoste got: Lê eger çêlik nêremê be?!

Şagirt got: Hêk celq dibe!.

--- --- ---

- Dadger ji diz pirs kir: Çawa te zêr dizîn bê ku kesek te bibîne?.

Diz got: Li min biborîne, ez bê pere te fêrî vî karî nakim!.

Dadger got: Min fêr bike, ezê bê pere te berdim!

--- --- ---

- Reşo mêrê Reşê winda bû, ji Reşê pirs kirin: Nîşanên Reşo çi ne?

Wê got: Dema ku Reşo ji mal derket, wî piştta xwe xurand û bi min re got: Bay Reşê!!!!.

--- --- ---

- Yekî bi hevalê xwe re got: Eger tu zanibî îşev şîva me çi ye, bila nivê şorba ku îşev şîva me ye, ya te be.

Hevalê wî got: Şîva we pelûl e!!!

--- --- ---

- Dadger ji diz re got: Min ji te bawer kir, ku te pere nedizîne, ji ber wê jî, tu serbestî, û ez te naşînim zîndanê.

Diz got: Sedî sed biryara te rast e, lê divê perên ku min dizîne, tu ji min nestînî !

--- --- ---

*Ji pirtûka: Pêkenokên Gelêrî – M. Berekat.*

# Pend û Gotinên Bapîran

1. Koçerê bê pez, cundê bê rez û mirovê bibêje ez, ew ne tişt in.
2. Ne mirovê pozbilind, ne mîvanê ji gund û ne jî mêrê li civat-an bibêje jina min rind e.
3. Yê ku bibêje û bike mêr e, yê ku nebêje û bike şêr e û yê ku bibêje û neke kerê nêr e.
4. Av û agir, mar û pûng bi hev re najîn.
5. Agirê eşqê germ e, dikeve nav hestî û çerm e, ne dibêjê fedî û ne jî şerm e.
6. Bav dimre kur har dibe, dê dimre keç jar dibe, dê û bav dimrin bira û xwîşk li hev dibanin.
7. Bi dilê zarokan hezbike û bi hişê mezinan bizewice.
8. Bi kerê re gotin: Were dawetê, got: Barê xelkê li ser piştamin e.
9. Zanayên xwe bi zindî mezin û xelat bikin, tenê term di goran de ne.
10. Şivanê ku kerê wî bigerîne, bila kurk ji xwe dîne yan jî, ew dîn e.



## Navê Kulîkekê Ji Kurdistanê

**Wehweh, wehwehok:** Berî ku teraktor derbasî jiyana cotkariyê bibin, cot bi dêwer dihate kirin, nemaze bi ga û çêlan. di destpêka meha Cotmehê de cotkaran dest bi çandina tov dikirin. Dema wan cot dajotin carina ga, an çêl rast nedîçû, çotkar werîs bi aliyê rastê de dikşand û deng lê dikir û digot: Weh çêlê, yan jî woh gayo.

Di meha Cotmehê de, ta ku baran jî nebarî be, kulîkine bejî, rengê wan zer û hin jî aravî li çolê derdikevin, jê re dibêjin ( Wehweh, wehwehok ), li hin herêman jî, navê wê ( kulîka çotariyan )e.